Rewşa kurd û Kurdistanê Li Kurdistana rojhilat

Rojnama Agirî ya partiya Demoqrata Kurdistana Îranê , hejmar[21] , di dermafê rewşa kambax ya gelê kurd de , li rojhilatî Kurdistanê weha dibêje : Şeva 29.7.2005 an , hêzên hov yên rijêma komara Îslamî ya Îranê , li Dola Nicnê ya bajarê Bane , çend karkerên wê herêmê dane ber guleyan û kesek bi navê Hekîm kuştî û yekî din jî bi navê Luqman Nesrulayî , kurê Esyîd Ebdula , xelkê Bane hate birîndarkirin .

Lê , welatiyên kurd xwestin wî bibin nexwaşxanê ,lê, hêzên rijimê nehîştin û gule bere wî jî dan û wî jî jiyana xwe ji dest da .

Roja 30.7.2005 an , xelkên bajarên Sine , Bane û Dîwandere piştevaniya wan şehîdan kirin . Û li vê dawiyê , li Mehabad , Serdeşt , Pîranşar û Şinoyê meş û xwepêşandanên piştgiriyê û nerazîbûnê kirin , dirûşmên dijî rijêmin kevneperest hildan û piştevanî ji tevgera kurd re avêtin . Û dûvere berdewam dike û dibêje: Rewşa bajarên Kurdistana Îranê aloz û awerte ye û ji aliyê hêzên rijimê ve bi tundî hatine mîlîtarîz kirin .

Ji wê hîngê û vir ve , rewşa gelê kurd li wir û bajar û gundên wan her diçû kambaxtir dibû . Û hejmara şehîd , birîndar û girtiyan her çû zêdetir bû .

Lê , mixabin em neçarên ku li tevgera xwe ya kurd li Sûriyê loman û rexnan bikin û jê bipirsin ka çima hûn bi erk û stubariyên xwe yên netewî di dermafê birayên xwe de ranebûn

Yekemîn Car e

Di bin siya navenda çandî li Reqê, komîta festîvala Reqê – Yekem -ya hunerên folkilorî, bi vexandineke fermî, **Koma Zozan** ya huner û folkilora Kurdî , bilî komên huner yên **Ereb**, **Çerkez**, **Ermen** û **Asûrî** vedixîne. Di şeva 20 ê heyva Tîrmehê de, **Koma Zozan**, bi cilên xwe yên folkilorî, bi beşdariya 700 kes, bêtirî katekê, hunera xwe pêşkêşî beşdaran dike.

Bêguman, ev yekem care ku, li welatê me, komên huner û folkirora gelên Sûriyê, bi hevre, bê çavsorî, hunera xwe pêşkêş dikin. Em bi hêvîne ku, ev reng kar, di jiyana me de berdewam be.

****

Bûk û zave pîroz bin

Hevalê me , endamê malbata weşana we Newroz, sekretêrê : Parta Demokrat a Kurd Li Sûriyê (YEKÎTÎ), berêz **Mehidîn Şêx Alî** , ligel xanima xwe **Ferîde Şêx Simehil zade** zewiçî . Sed ű yek carî , li hevdu pîroz bin , qubet li keç ű kuran be . Xwazî ku , keç ű kurên wan perwerdeke xwaş ű çiwan , li ser rêça bavê werbigirin .